Xemgîniya piştî weldandinê

Hindek caran piştî weldandina zarokekî her tişt ne wisa ye, wek ku merov ji xwe re hêvî kiriye. Hestên merov li bin guhê hev û din dikevin û tiştekî serrast nîn e. Di dema, ku hindek jin ji aliyê derûnî ve gelekî hestnazik dibin (Babyblues), 10 ji sedî ji wan bi nexweşîna xemgîniya piştî weldandinê (postpartalen Depression) dikevin, ku diyardeyên wê jî ev in: westiyan, kêmhêzî, hest bi sûcî, zehmetiya mijûlbûna li ser tiştekî û nebaşrazan, tirs, hestên dualî beramber zaroka nû çêbûyî heta bi fikarên xwekuştinê.

Ev nexweşî dikare baş were dermankirin, heger merov zû pê hesiya.

Heger pirsên we derbarê vê mijarê hebin yan heger hun di wê behweriyê de bin, ku dibe, hun bi vê nexweşînê ketibin, hun dikarin ser seran û ser çavan têkiliyê bi me re deynin: 0228/224155

Em dikarin di hevpeyvîneke şexsî de – heger bixwazin, em dikarin li ba we li malê li hev rûnin – we û malbata we derbarê vê nexweşînê û xizmetguzariyên alîkariyê yên heyîn, agahdar bikin. Em dikarin her wekî din jî bi hev re binerin, ka çi pêdiviyên we bi alîkariyê hene û em dikarin bi we re li xizmetguzariyên bikêrhatî bigerin û herin ba wan.

Hun dikarin li ser malpera me www.fruehehilfen-bonn.de agahdariyên berferehtir û herweha pirsnameyeke nirxandina we ji bo şexsê we û derfetên alîkariyê peyda bikin.

Ji kerema xwe re, heger derfet hebe, kesekî bi xwe re bînin, taku alîkariya we ji bo wergerandinê bike yan heger wergerandin ji we re lazim be, ji kerema xwe re ji me re bêjin.